

Benckirin bo neştergerîyên sereke

Bi girêdanbûna bilind a plankirî yan
di paş da bi lînerînek sifî

Ev belavok ravekirina bendewariyan dike ku di dema ku meriv bo neştergeriyên mezin bencê werdigire û li yekîneya girêdayîbûna bilind (HDU) an paşê li yekîneya nexweşiyên giran (ICU) dimîne hêvî dike. Ew ji hêla pisporên bencê ve bi alîkariya nexweş û nûnerên nexweşan ve hatî nivîsandin.

Belavokê cureyên din yê bûjenên benckir li xwe nagire. Ji bo vê yekê, belavokê bixwînin: **Hûn û pisporê bencê** li ser malpera me bi zimanê we heye www.rcoa.ac.uk/patientinfo/translations

Naverok

Belavok van xalan rave dike:

- xalên derbarê mayîna li yekîneya nexweşiyên giran (ICU) yan yekîneya girêdayîbûna bilind (HDU) piştî neştergeriyê
- berî neştergeriyê çi dibe
- Bo neştergeriyê amadehî çawa tên kirin
- di roja neştergeriyê de çi dibe
- piştî neştergeriyê çi dibe
- hûn ê çawa bi anesteziştê xwe re metirsî û vebijêrkan gengeşe bikin
- agahiyên zêdetir li ku tên dîtin.

Niştergeriyên serke û lînerîna sifî

Lînerîna sifî û yekîneyên girêdayîbûna bilind beşên taybet in ku li nexweşên ku bi giranî nexweş ketine miqate dibin. Piştî neştergeriyê mezin, hin nexweş dê bêne birin bo yekîneya nexweşên giran (ICU) an yekîneya girêdayîbûna bilind (HDU) ku li wir ew ê ji nêz ve ji hêla nûjdar û bijîşkên taybet ve werin miqatebûn. yekîneya nexweşên giran (ICU) û yekîneya girêdayîbûna bilind (HDU) dikarin dermankirin û alavên ku bi gelemperî di beşên normal de peyda nabin peyda bikin. Nişterger an pisprê anesteziştê

we dê bi we re nîqaş bike ka hûn hewce ne ku piştî emeliyata we hûn di yekîneya nexweşên giran(ICU) an yekîneya girêdayîbûna bilind de (HDU) bimînin.

Nirxandina berê niştergeriyê ya klînîkê (klînîka pêş-nirxandinê)

Bi gelemperî ji we tê xwestin ku hûn çend hefte beriya emeliyata xwe werin klînîkek nirxandina pêş-niştergerî. Ji bo piştgiyîya we anîna endamekî malbatê an jî hevaleyê bikêrhatî ye.

Ji kerema xwe van tiştan bi xwe re bînin:

- lîsta dermanên ku hûn dixwin an jî dermanên ku di pakêtên xwe ên normal de ne
- çi agahiyên we li ser test û dermankirinên li nexweşxaneyên din hebin
- çi agahiyên li ser alerjî an pirsgerêkên girêdayî bencê ku hûn an malbata we derbas kiriye
- pîvanên fişara xwînê ya herî dawî.

Nûdarek dê derbarê astên tenduristî û çalakiya we pirsên berfireh ji we bipirse.

- Testên xwînê, ECGyek (elektrokardiyogram an şopandina dil) û carinan testên din dê werin kirin an jî bînin xwestin. Dibe ku ji we bê xwestin ku hûn CPET (testa rahênan ya kardiyopulmonarî) li ser duçerxeya rahênanan bikin da ku binerîn bê ka dil û pişik di bêhnvedanê da û di dema rahênanê da çawa dixebitin. Ev dikare ji bo texmînkirina başbûna laşê we bi neştergeriyê û başbûnê ra bibe alîkar. Ev dê alîkariya bijîşkan bike ku li ser metirsiyên neştergeriyê ji bo we biryaran bidin û bizanin ka gelo divê hûn di ICU an jî HDU da baş bibin yan na.
- Hûn dikarin bernameyeke werzîş û xwarinê derbas bikin da ku hûn berî emeliyatê bibin xwedî laşêke bihêztir. Ev yek wekî 'pêş-rehabîlîtasyonê' tê zanîn.
- Pizîşkê bencê dikare bi we re li ser benckirinê (anestezî) û li ser metirsiyên taybet yê girêdayî we biaxive. Heke ev bi we neyê pêşkêşkirin û hûn dixwazin bi pizîşkê bencê re biaxivin, divê hûn daxwaza vê yekê bikin.
- Eger we rewşên din ên bijîşkî (wek nexweşiya şekir, bêtengî, xwînpestina bilind, an jî bêxwînî) hebin, karmendên li klînîkê wê der barê wan de pirsan ji we bipirsin. Heke dikarin bînin baştir kirin, dibe ku ji we bê xwestin ku hûn pisporên din an jî bijîşkê xwe yê giştî bibînin. Dibe ku guhertinên di dermankirina we de carinan hewce bikin. Carinan heta ku rewşa we ya tenduristiyê baş bibe dibe ku emeliyata we bê dereng kirin.
- Nûjdar wê çend agahiyan bide der barê ka wê berî niştergeriyê û li dem û piştî emeliyatê çi biqewime. Ji bo pirsîna pirsan û gotûbêj kirin hizran û derda, ev demeke baş e.
- Berîya neştergeriyê hûn dê talîmatên zelal bidin we ku hûn dê kengî xwarin û vexwarinê rawestînin. Ya girîng şopandina vê şîretê ye. Heke di dema benca we de di zikê we de xwarin an jî şilavî hebe, ew dibe ku bikeve qirika we û têkeve pişika we.
- Her weha divê di derheqê dermanên ku hûn dixwin û gelo divê hûn heta roja neştergeriya xwe xwarina wan bidomînin an na de rênimayan werbigirin. .

Gelek tişt hene ku hûn dikarin bikin da ku hûn xwe ji bo niştergeriyê û dema başbûnê amade bikin. Nexweşên ku ji aliyê laşî ve bihêztir dikarin asta tenduristî û çalakiya xwe baştir bikin ji neştergeriyê zûtir û bi tevliheviyên hindiktir xelas dibin.

Çavkanîyên me yê **Saxtir Baştir Zûtir** dê agahiyên ku hûn hewce ne da ku hûn xwe ji bo neştergerîya xwe çêtir amade bikin dabîb bike. Ji kerema xwe malpera me ji bo bêtir agahiyên bi zimanê xwe bibînin: www.rcoa.ac.uk/patientinfo/translations

Di roja emeliyatê de

Pêwîst e ku hûn bi baldarî û bi rênimayên di derbarê xwarin, vexwarin û xwarina derman an jî tabletan de hatine dayîn pabend bin .

Hevdîtina bi pisporê benca xwe re

Hûn dikarin li nixandina berê ya klînîkê anesteziyê bibînin. Her wiha, hûn ê roja neştergerîya xwe li nexweşxaneyê bi pisporê bencê ra hevdîtinekê bikin. Bijîşkê bence ew kes e ku di bencê, dermankirina êşê û lênêrîna nexweşên li ICU'yê de de perwerdeya pisporî wergirtiye.

Dibe ku ew :

- dîsa li ser tenduristiya xwe bipirsin, agahiyên ku di klînîka pêş-nixandinê de hatine qeydkirin zelal bikin an jî piştrast bikin
- encamên testa xwe binihêrin
- li dilê xwe guhdarî bike û bêhnê bistîne
- Li stû, çenge, dev û diranên xwe binêre.

Bijîşka bencê dê ji we re li ser benckirinê biaxive, her kiriyarên din ên ku dibe ku di dema neştergeriyê de li te binêrin û rêbazên kêmkirina êşê nîqaş bikin. Ew dê bikaribin bersiva pirs û fikarên we derbara benckirinê nîqaş bikin.

Bo neştergerîy amade dibin

- Dê ji we bê xwestin ku hûn kincên xwe biguherin û dibe ku ji bo stokên zextê bîn pîvandî. Lixwekirina van cilan pêşî li meyînên xwînê di lingan da digire.
- Dibe ku testên din yê xwînê bîn kirin.
- Endamekî xebatkaran dê lîsteya kontrolê temam bike û te bibe jora neştergeriyê. Dibe hûn biçin odeya neştergeriyê bi kursiyeka biteker yan bi erebeyê bi kar bînin.
- Heke berçavka we hebe, amûrên bihîstinê an jî diranên we hebin, hûn dikarin wan li xwe bikin da ku biçin odeya emeliyatê. Lê berî ku benc dest pê bike, ji bo ku zirar nebînin an jî ji cihê wan neyên derxistin divê hûn wan rakin.

Beşa neştergeriyê ('odeya neştergeriyê')

Dema ku hûn gihîştin odeya neştergeriyê, karmendên wê dê nasnameya we, neştergerîya ku hûn bikin û alerjiyên we piştrast bikin. Heke pirsek an jî derdek we hebe, divê hûn ji karmendekî ra bibêjin.

- Bijîşka bencê we, pisporên tendûristî yê ku alîkarîya bijîşka bencê û hemşîreyên odeya neştergeriyê dikin dê li wir bin da ku li we miqate bin. Dibe ku xwendevanên bijîşkên bencê û pijîşkî din jî hebin. Tu dikarin bibêji ku tu ji amadebûna xwendekaran ne rehetî.
- Amorên ku bi dil ve girêdanî ne fişara xwînê û asta oksîjenê her tim dişopînin. Pedên çir yê li ser sînga we dê we bi çavdêr ya dil ve girê bide û klîbeke biçûk a li tilî an jî nermika guhî ji bo pîvana asta oksîjenê di xwîna we de tê bikaranîn.

- Bijîşka bencê dê derzîyekê bi kar bîne da ku kanûla (borrî plastîk a zirav) têxe damareke li ser piştê dest an jî çengê we. Ev ji bo ku di dema neştergerîyê de derman û şile (dilop' bide we tê bikaranîn. Dibe ku hûn bikarbin krema benckira bo derên taybet bistînin da ku awal ve herême bi tevîzînin.
- Carinan dibe ku pêdivîya kanûlaka din li stûyê we were zêdekirin, ji bo ku di dema neştergerîya we û piştî tê da were tedawîkirin û çavdêrîkirin. Bijîşka benca we vê yekê bi we re gotûbêj bike.
- Li gor cureya neştergerîyê, û li ser tenduristiya we ya giştî, dibe ku bijîşka bencê curek din a kanûle têxe nav demarekê, ku jê re xeta xwînber tê gotin. Ev bi gelemperî tê kirin gava ku hûn di xew de ye. Ev dihele ku fişara xwîna we bi berdewamî were pîvandî û di dema neştergerîyê de ji bo testên xwînê yên zêdetir jî dikare were bikaranîn.
- Heke hûn ji bo sivikkirina êşê penca piştî an jî epîduralê wergirin, ev dê bi gelemperî berîya ku penca giştî hebe dê bê kirin.

Dema ku amadekarî hemû qediyar, pizîşkê pencê wê oksîjenê bide we ku bi rêya maskeyê bêhnê bistîne, di heman demê de hêdî dermanên pencê li kanûla we dixe. Ji vê gavê ve heta ku neştergerîyê biqedin hûn ê hay ji tiştekî dî nebî.

Piştî ku hûn radizin, dibe ku amorên din ji bo hin neştergerîyan werin bicîh kirin ku ji fîmê re bibin alîkar ku rewşa we di dema neştergerîyê de çavdêrî bikin û şilavan bide we.

Xwînveguhaztin

Di hemû neştergerîyên mezin da gera xwînguhaztinê heye. Tenê ku pêdivî bi xwînê hebe xwîn tê dayîn. Heke hûn naxwazin xwînguhaztinê bikî divê berîya roja neştergerîyê bi pizîşkê xwe ra gotûbêj bikî.

Hûn dikarin ji berê ve ji bijîşka bencê xwe bipirsî, derbarê xwînguhaztinê û alternatîfên din da zêdetir agahîyan bistînin. An jî hûn dikarin malpera NHS serdan bikin:

www.nhs.uk/what-we-do/blood-services/blood-transfusion

Dermankirina sivikkirina êşê

Giring e ku êşandin bi rêkûpêk bê kêmkirin. Ev dike ku hûn xwe baştir hîs bikin, alîkarîya we bike ku hûn zûtir baş bibin û dibe ku şansê hin pirsgerêkên kêmtir bike.

Heke piştî neştergerîyê hûn dikarin bêhneke kûr bistînin û kuxikê baş bistînin, îhtîmal heye ku hûn kulbûn a enfeksiyona singê bi pêş bixî.

Heke hûn bikarbin lingên xwe bilivînin û bimeşin, kêmtir dibe ku hûn meyndîna xwînê bistînin (meyandîna Demarên Kûr an jî DVT).

An wek tabletekê an jî bi dev an jî bi kanûla xwe dê alîkarîya êşê ya birêkûpêk ji we ra bê dayîn. Dibe ku ji bo we yek an jî zêdetir formên alîkarîya êşê guncaw be ku pizîşkê pencê we dê bi we ra nîqaş bike.

Epîdural

Bijîşka benca we derzîyekê bi kar tîne ji bo ku boriyek plastîk (sonda) a zirav têxe navbera hestiyên piştê we. Ev bi gelemperî berîya razana we tê kirin. Benckira herême bi rêya vê lûleyê di dema neştergerîyê de tê dayîn û piştî çend rojan. Dema epîduralê bikaranîn, dibe ku sing, zik û lingên we tevîzandin bibin û dibe ku lingên we bi qasî normal xurt hîs neke. ev mimkîne çê bibe dema ku derziya epîduralê bikar anîn û ew ê vegere rewşa normal dema ku benckira herême xilas bibe.

Ji bo bêtir agahdarî li ser benckirina epîdural bi zimanê xwe yê zikmakî, ji kerema xwe biçe malpera me li ser www.rcoa.ac.uk/patientinfo/translations.

Benca piştî

Benckira herêmî bi derziyek ku di navbera movikên piştî we yê jêrîn de tê derzî kirin da ku demarên ji bejnê ber bi jêr ve bi tevizine. Tevizandîbûn bi piranî di navbera du û çar saetan de berdewam dike. Di heman demê de dibe ku dermanek kêmkirina êşê ya dirêjtir jî were derzî kirin, ku dibe ku heşt saetan an jî zêdetir bidome.

Ji bo bêtir agahdarî li ser benca piştî bi zimanê xwe yê zikmakî, ji kerema xwe biçe malpera me li ser www.rcoa.ac.uk/patientinfo/translations.

Asta sivikkirina êşê ya jêr kontrola kesê nexweş (PCA)

Ev cûrek kêmkirina êşê ye ku hûn bi xwe kontrol dikin. Pompek ku êşbirek bi hêz heye bi kanûla we ve girêdayî ye. Amorek bi bişkokek ku pompê çalak dike bi we tê dayîn. Dema ku hûn bişkojkê pê bikin, dozê piçûk tê dayîn. Pompê xwedan mîhengên ewlehiyê ye ku pêşî li we bigire ku hûn bi xeletî pir zêde nebin.

Qesterên birînê

Penca taybetçihî bi riya yek an çend lûleyên plastîk ên piçûk li devera li dora birîna we tê meşandin. Armanc ew e ku li dora birînê deverekek bêhêz çêbike. Emeliyatkêr yan bijîşkê Pencê van lûleyan di dema neştergeriyê de bi cîh dike. Ew bi pompek ve girêdayî ne ku bi berdewamî penca taybetçihî dide. qesterên birînê dikarin çend rojan piştî neştergeriyê we li cihê xwe bimînin.

Ji bo hin kesan, pêdivî ye ku forma plankirî ya sivikkirina êşê piştî neştergeriyê were guheztin.

- Hin kes ji yêrîn din bêtir bi kêmkirina êşê re hewce ne an jî bi rengek cûda bersivê didin dermanên kêmkirina êşê. Diftengî dibe ku êşa mirov dike zêde bike.
- Heger êşa we hebe, dibe ku peyrewên kêmkirina êşê ya ku ji we re hatibû destnîşan kirin bê zêdekirin, ku pir caran bi we bê dayîn, an jî bi yekgirtên cûda were dayîn.

Piştî neştergeriyê

Pir kes dê piştî neştergeriyê li devera başbûnê şiyar bibin. Hemşîreye başbûnê dê her dem bi we re be. Dibe ku hin kes rasterast biçin yekîneya lûnêrîna sifî an jî bendeyiya yekîneya bilind.

Hemşîreye başbûnê dê:

- Çavdêriya fişara xwînê, asta oksîjenê û rêjeya nebza we bike
- dê oksîjenê bide we bi rûpoşek an pêlên plastîk ên nerm ên ku di hundurê pozê de tîne danîn
- asta êşa we dinexîne û dermanên bêtir bi we dide bo kêmkirina êşê heke hewce be
- dermanên dijî nexweşiyê bi we dide eger hûn nexweş bin
- heke hûn be sarmayê bihsin, ew ê we bi betaniyek germ we binuxmîne
- dema ku hûn şiyar bibin dê taximê diranan, amûrên bihîstinê û yêrîn qedehên/lensên têkiliyê li we vegeîne.

Ger we derziyek epîdural ji bo kêmkirina êşê bikar anî be, hemşîreya başbûnê dê kontrol bike ka ew çiqas bandorker e. Heke hûn nerehet in, bijîşkê pencê yê te dikare derziya piştê sererast bike an jî dermanên tir yê sivkirina êşê bide te.

Çavdêriya Tîndar an Çavdêriya Girêbûna Bilind (ICU an HDU)

Dema ku hûn şiyar û rehet bin, hûn ê ji devera başbûnê werin veguheztin ICU an HDU, li wir hûn ê çavdêriya nêzik û ger hewce bike dermankirina pispore bistînin.

Carinan, piştî ku emeliyat qediya çend saetan an jî heya ku rewşa we aram bibe, hewce ye ku pencê bîdomînin. Ger hewcedariya we bi vî rengî Çavdêriyê hebe, bijîşkê we yê bencê piştî neştergeriyê we rasterast dê bibe yekîneya lînêrîna sifî. Dema ku rewşa we destûrê bide, fîmê amûra bêhngirtinê dê bihêle ku hûn ji bo xwe nefesê bigirin û hûn ê hêdî şiyar bibin. Dema ku rewşa we destûrê bide, fîmê yekîneya lînêrîna sifî dê bihêle ku hûn bi xwe nefesê bigirin û hûn ê hêdî hêdî şiyar bibin.

Li ser HDU an ICU, hûn ê ji hêla bijîşk, hemşîre, fîzototerapî û parêzvanên ku di Çavdêriya Girêbûna Bilind an Çavdêriya Tîndar de pispore in ve werin şopandin. Ew bi fîmê weya neştergerî re ji nêz ve dixebitin da ku pê ewle bibin ku başbûna we baş pêşve diçe. Gava ku başbûna we berdewam dike, dibe ku hûn ji yekîneya lînêrîna sifî berbi bendeyiya yekîneya bilind yê bînd veguheztin.

Dibe ku hemşîreya we, an hemşîreyek ku çavdêriya nexweşan dike hebe. Ew ê piştrast bikin ku hûn rehet in û bo kontrolkirina nexweşiyê û pêşîlêgirtina meyînên xwînê dermanên destnîşankirî bidî. Dibe ku hin dermanên ku we li malê dixwarin werin sekinandin an jî biguhezin da ku alîkariya başbûna we bikin. Di destpêkê de dibe ku hûn hewcedariya dîlopek bikin da ku şilavê bidî damarên we, lê hemşîreya we dê we hand bike ku gava ku hûn bikarin vexwin û bixwin ji ber ku ev alîkariya başbûna we dike.

Di yekîneya lînêrîna sifî an bendeyiya yekîneya bilind de, rêjeya dil, fişara xwînê, bêhngirtin û karê gurçikê we dê ji nêz ve were şopandin. Di heman demê de dibe ku hûn tîstên xwînê, tîrêjên-X an skanan jî bikin da ku pêşkeftina we kontrol bike an pîrsgirêkek teşhîs bike. Her ku başbûna we pêşve biçe, hûn hewceyê kêmtir çavdêriyê dibin, û hin dîlop, lûle û cihazên çavdêriya we dê werin rakirin.

Hemşîre û fîzyoterapîst dê hînkirina bêhngirtinê yê bi berdewam fêrî we bikin. Pir girîng e ku hûn di tevahiya dema xwe ya li ser yekîneya lînêrîna sifî an bendeyiya yekîneya bilind de bi awayekî kûr nefesê bigire û baş bikuxe. Ev dê bibe alîkar ku enfeksiyona singê bi we re çê nebe.

Fîzyoterapîst jî dê ji we re bibin alîkar ku hûn zûtirîn dem li ser text rabin û tevgerê bikin. Ev jî hînkirina bêhngirtinê re baş e. Tevger û meşîn bi taybetî girîng in ji bo domandina hêza masûlkeya we, baştirkirina gerîdeya di lîngan de û zêdekirina rehetiya we.

Dema ku hûn li yekîneya lînêrîna sifî an bendeyiya yekîneya bilind bin, hûn karibin mêvanan bibînin. Hemşîreya we dê bikaribe li ser demên serdanê û hejmara serdanan destûrê şîretan li we bike. Dibe ku ew li te miqate bin li devereke ku nexweşên din ên pîr nexweş lê hebin. Dibe ku ji bo zarokên biçûk ne gunca be ku werin serdana we, heke pîr çalakî hebe, dibe ku hewcedarî bi kêmkirina serdanê bi demkî hebe.

Başbûn û vegerîna malê

Gava ku fîma li we dinihêre razî be di yekîneya lînêrîna sifî and ji bendeyiya yekîneya bilind ku hûn bi ewlehî baş dibin, hûn dê vegerin beşa neştergeriyê.

Dirêjahiya dema ku hûn di yekîneya lîstîkê an bendeyîya yekîneya bilind û kengê hûn ê karibin herin malê de derbas dîkin girêdayî ye bi jurê neştergerîyê we re, û çî tevlihevî û pirsgerîkên tenduristiyê yê din ên ku we hebin.

Hin nexweşxane bernamêyên başbûnê yê wekî Başbûna Pêşkefî pêşkêş dîkin. Hûn dikarin li ser vê yekê zêdetir bizanin li: www.nhs.uk/conditions/enhanced-recovery

Piştî neştergerîyê hûn ê nikaribin çî otombîl û wesayîtan biajonin, ji ber vê yekê hûn ê hewce bibin ku hûn texsîyekê bigirin an jî gazî kesekî bikin ku we bigihîne malên we.

Beî ku hûn derbikevin dê ji we re agahdarî li ser hemî temrînên ku hûn bikin ji bo ku hûn baş bibin û agahdarî li ser çawaniya lîstîkê birîna xwe bidin we.

Divê hûn bi Bîjîşkê Giştîyê yê xwe an nexweşxaneyê ku we neştergerî lê kiriye re têkiliyê daynin, heke:

- êşa we ya giran heye an jî êşa we zêde girantir dibe
- di beşa laşê we ya ku we neştergerî kiriye de êş û werimîn hebin
- hûn êşa sîngê û zehmetiya bêhngirtinê hîs dîkin
- heger xemên we hebin ku di agahdarîyên derbarê derketina ji nexweşxanê de ku dê ji hêla nexweşxaneyê ve hatî dayîn de cîh negirin.

Heke xwe nebaş hîs bikin, divê hûn di zûtirîn demê de biçin beşa lezgîn a herî nêzik.

Metirsî û biryara hevpar

Benckirên nûjen pir ewledar in. Ji dermana bencê an jî amûrên ku tên bikar anîn bandor din hene, ku bi piranî ne bi metirsî an demdirêjtir in. Çî metirsî di navbera kesan de cûda bin û bi rêbaz û teknîka benckirê ku tê bikaranîn ve were girêdan.

Anestazîkerê we dê bi we re li ser talûkeyên ku ew bawer dîkin ku ji we re girîngtir in gotûbêj bikin. Ew ê tenê metirsîyên ku kêmîr hevpar in nîqaş bikin heger ew xetere têkildarî we be.

Biryargirtina hevpar

Biryargirtina hevpar piştrast dike ku kes tene piştgirî kirin ku biryarên ku ji bo wan rast in bidin. Ew pêvajoyek hevkarîyê ye ku bi navgîniya bîjîşkek piştgirîya nexweşekî dike da ku derbarê dermankirina xwe de bigihîje biryarekê.

Di axaftinê de wiha tê gotin:

- pisporîya bîjîşkî, wekî vebijêrkên dermankirinê, delîl, metirsî, û sûd
- tiştên ku nexweş baştir dizanin: tercîhên wan, şert û mercên kesane, armanc, nîrx û bawerîyên wan.

Bo agahîyên zêdetir: www.england.nhs.uk/personalisedcare/shared-decision-making

Li vir hin amûr hene ku hûn dikarin bikar bînin da ku bi baştir nîqaşên xwe bi anestezîst an xebatkarên nîrxandina emeliyatê re bikin:

Hilbijartina çarçoveya Wisely UK BRAN

Vê yekê wekî bibîrxistinekê bi kar bînin da ku hûn li ser dermankirinê pirsan bipirsin.

https://bit.ly/CWUK_leaflet

NHS sê pirsan dipirse

Dibe ku di derbarê çavdêriya tenduristîya we de hîlbijartin hebin.

https://bit.ly/NHS_A3Qs

Navenda Çavdêriya Nişterkarî (CPOC)

CPOC anîmasyonê hilberandîye da ku biryargirtina hevpar rave bike.

www.cpoc.org.uk/shared-decision-making

Pirsên ku dibe ku hûn bixwazin bipirsin

Heger pirsên we di derbarê benckirê xwe de hebin, wan binivîsin (hûn dikarin mînakên jêrîn bikar bînin û yê xwe li cîhê jêrîn zêde bikin). Heger hûn dixwazin rojekê berî niştergeriyê bi pîspor bencê re bipeyivin, bi koma nixandina berî niştergeriyê re têkevi têkiliyê da ku ji we re derfetê saz bike ku hûn bi telefonê bi pîsporê bencê re biaxivin an wan di klînîkê de bibînin.

1. **Metirsîên taybê ji bo min çi ne?**
2. **Çi cûre derman bo kêmkirina êşê bo min pêşniyaza dîkin?**
3. **Çima ez ê bi taybê hewceyê bendeyiya yekîneya bilind an yekîneya lînêrîna sifî bikim?**

Çavkaniyên bêtir yê agahdariyê

Ji bo bêtir agahdarî li ser belavokên bi zîmanê xwe yê zikmakî, ji kerema xwe biçe malpera me: www.rcoa.ac.uk/patientinfo/translations.

Dibe ku belavok ji beşa benckirê an nixandina berê niştergeriyê ya klînîka we jî peyda bibin.

Fakulteya Bijişkiya Lînêrîna Sifî ji bo nexweş û nihêrvan di lînihêrîna sifî de gelek çavkaniyên kêrhatî hene: www.ficm.ac.uk/for-patients

Destjêkişandin

Em gelek hewl didin da ku agahiya li vê namilkeyê durist lidar bixin û nûvejen bikin, lê em nikarin li vê ewlehî bikin. Em guman nakin ku ev agahîya gelemper bibe bersivên hemû pirsên we yê gengaz an jî bibe çareserîya her tiştên ji bo we girîng. Bi riya bikaranîna vê namilkeya ku wek pêşber, divê hûn bi fîma bijîjkî ra li ser bijarîyên û metirsîyên xwe bikevin nîqaşê. Divê ev namilkeya xwe bi xwe wek şêwirek neyê bidesthilgirtin. Ev jî bo armancek bazarî an jî karî nayê bikaranîn. Ji bo redandina berpisriyarîyê, ji kerema xwe ra li vir bitîkînin (www.rcoa.ac.uk/patient-information/translations/kurmanji).

Hemû wergeran jî alî wergervanên jî civaka Translators Without Borders (Wergervanên Bêsinor) tên çêkirin. Çawanîya van wergeran jî bo duristîya van heta ji dest tê tên venihartin, lê xetere heye ku hin agahîyan nedurist bin û çewt hatibin wergerandin.

Ji me re bêjîn ka hûn çi difikirin

Ger şîroveyên we hebin, ji kerema xwe wan bi vê e-mailê re bişînin : patientinformation@rcoa.ac.uk

Royal College of Anaesthetists

Churchill House, 35 Red Lion Square, London WC1R 4SG
020 7092 1500

www.rcoa.ac.uk

Çapa Sêyemîn, Nîsana 2023

Ev belavok dê di nav sê salên piştî roja weşanê de were nîrxandin.

© 2023 Royal College of Anaesthetists

Dibe ku ev belavok jî bo çêkirina bûjena agahiya nexweşê were kopî kirin. Ji kerema xwe, çavkanîya orijînal binivîsin. Heke hûn dixwazin beşek ji vê belavokê di weşaneke din de bikar binin, divê destûreke guncaw were dayîn û logo, marka û wêne werin rakirin. Ji bo agahiyên zêdetir, ji kerema xwe bi me re têkevin têkiliyê.